Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1010 | 2-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# 6. Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol: Herî zêde pirtûkên kurdî hatin kirîn

**Endamê Komîteya Amadekar a Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol Ebûd Mexso destnîşan kir ku wan hewl da îsal rexneyên salên borî û kêmasiyên derketine derbas bikin da ku pêşangehê pêş bixin. Her wiha diyar kir ku rêjeya kirîna pirtûkên bi zimanê kurdî ji salên borî baştir bû.**



Ji bo teşwîqkirina civakê li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî û pêşxistina çanda xwendinê li herêmê, Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi koordîneya Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê 6`emîn Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol di 22`yê Cotmehê de li hola Zana ya Qamişlo vekir.

Pêşangeha bi dirûşma `Pirtûk samanê cîhanê ye' heta 29`ê Cotmehê berdewam kir. Gelek rewşenbîr û xwîner ji hemû pêkhateyên herêmê beşdar bûn. Her wiha xwendekarên dibistanan, nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser serdana pêşangehê kir.




Nivîskarên beşdarî pêşangehê bûne gotin pêşangeh, roleke çalak di piştgiriya nivîskaran de lîst ku pirtûkên xwe pêşkêş bikin û şêniyan teşwîqî xwendin û nivîsandina bi zimanê dayikê bikin û çand û dîroka xwe nas bikin.

### Derbaskirina kêmasiyan

Endamê Komîteya Amadekar a Pêşangehê Pirtûkan a Şehîd Herekol, Ebûd Mexso got: "Roj bi roj hejmara serlêder zêde bûn. Îsal me hewl da hemû rexneyên par ên li me bi taybet ên girêdayî bihayên pirtûkan derbas bikin. Piraniya pirtûkên xwecih, ji salên borî erzantir bûn."

Li rex hewldanên Komîteya Amadekar, di pêşangehê de pêşbirgkên çandî hatin lidarxistin û kesên serkeftî bi pirtûk hatin xelatkirin. Her wiha pirtûk bê pere li serlêderan hat belavkirin. Panel û şahiyên îmzekirina pirtûkan hatin lidarxistin.

### Rêjeya kirîna pirtûkan

Di pêşangehê de zêdetirî 50 weşanxane, pirtûkxane û saziyên çandî yên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Şam, Heleb, Laziqiye, Iraq, Başûr û Bakurê Kurdistanê, Misir, Tirkiye, Balçîka û dewletên din ên Ewropa beşdarî bûn. 130 hezar pirtûk bi 13 hezar serenavên cuda û mijarên cuda; dîrokî, wêjeyî, siyasî, civakî, bi zimanên erebî û kurdî (kurmancî, soranî û zazakî), inglîzî û fransî hatin pêşandan.

Ebûd Mexso diyar kir ku îsal herî zêde serlêder pirtûkên bi zimanê kurdî dikirîn ku mijarên wê dîrok, lêkolîn, folklor û çanda kurdî bûn, lê kirîna roman û helbesta kurdî îsal kêm bûn.

Mexso destnîşan kir ku kirîna pirtûkên bi zimanê kurdî ji zimanên din bêtir û got, ev yek asta girêdana wan a bi dîroka kurdî û parastina zimanê dayikê nîşan dide.

Mexso têkildarî pirtûkên kurdî yên hatine kirîn, hejmareke zelal bi bîr nexist, lê belê agahiyên xwe spartin weşanxaneyên beşdarî pêşangehê bûbûn.

### Plansaziya bê ya komîteya amadekar

Ebûd Mexso balkişand ser plansaziya wan a sala bê û got: "Îsal, cih teng bû. Ji ber wê me bi Rêveberiya Xweser re nîqaş kir ku ji bo sala bê cihekî mezintir diyar bikin da ku pêşangehê lê vekin."

Her wiha Mexso îşaret bi armanca yekemîn a pêşangehê kir û got: Armanca me ji vekirina vê pêşangehê, pêşxistina civakê û teşwîqkirina beşên wê li ser xwendin û nivisandina bi hemû zimanan e. Di sala yekemîn a pêşangehê de, me texmîn nekir ku bigihêjin vê astê û bi hezaran pirtûkên cihereng ji welatên cuda yên cîhanê di pêşangehê de werin pêşandan.*-ANHA*


# Şonaya Kurdî û vexwarina Qehweya Tehl!

**Heger rewşa Derwêş ji bo şano weke nîşaneyekê bê nirxandin, merov dikare bêje; 'şanoya Kurdî weke Derwêş mirin daye ber çavên xwe û heta dawiyê jî wê bidome'. Lewma, di hemû şert û mercan de li ber xwe dide û li hember hemû bê derfetî û qedexeyan, ew "Qehweya Tehl" bi ser zengiloka xwe ve dadiqurtîne û rêwîtiya xwe didomîne.**

Li parçeyên din yên Kurdistanê şanoya Kurdî çawa xwe li ser dikê bi rêxistin kir û ava kir ez zêde nizanim lê li Kurdistana Bakur em dizanin ku di jêrzemînan de dest pê kir û heta îro hat. Bi dizî xwe bi rêxistin kir, tenê ne ji dewletê her wiha gelek lîstikvanan ji malbatên xwe bi dizî vî karî kirin û li hember qedexeyan serî netewandin. Heta îro dibêjim ji ber îro em dibînin ku li çar perçeyên Kurdistanê festîvalên şanoyê tên lidarxistin û şanoya Kurdî li hember qedexe û pêkûtiyan li ser dikê li ber xwe dide. Roj bi roj ew xurttir dibe û temaşevanên xwe zêde dike. Lê rêwîtiya şanoya Kurdî ya ku xwe gihandiye roja me ya îro ku salonên xwe heta ser dev tije dike jidil jî balkêş e. Bi gelek serpêhatiyên ecêb re rû bi rû maye. Nexasim li Kurdistana Bakur serpêhatiya şanoya Kurdî bi ecêbên xwedê dagirtiye. Ji ber wê jî pirr normal e ku ew bibe mijara tez, film, belgefilm û lîstikên şanoyê. Koma Şanoyê ya "Teatra Jiyana Nû" ku ev salên dirêj in di bin banê NÇM'yê de lîstikên Kurdî derdixe ser dikê û hewl dide şanoya Kurdî vejîne vê carê jî bi lîstika xwe ya "Lîstik" bi serpêhatiyên sosret yên şanoya Kurdî daketiye û rewşa şanoya Kurdî ya li Kurdistana Bakur radixe ber çavan. Dema mesele dibe şanoya Kurdî bêguman lîstik di nav lîstikê de û şano di nav şanoyê de xwe dide der. Ji ber sosretên ku hatine serê şanoya Kurdî meriv ancax bi vî awayî karibe vebêje û bîne ziman. Ji ber vî awayî "Lîstik" helwêst û pêkûtiyên li hember şanoya Kurdî bi awayekî serketî derdixe ser dikê. Lê vê ya rasterast nake, bi riya "Derwêş û Edûlê" dike. Ji ber mijara "Lîstik"ê destana Derwêş û Edûlê ye.

### *Di salona mohrkirî de hewldana şanoyê*

Derhênerekî Kurd di salona ku hatiye mohrkirin de dixwaze bi dizî lîstika "Derwêş û Edûlê" derxe ser dikê. Di lîstikê de bi awayekî îronî behsa "profesyonelbûn"ê tê kirin û derhênerê lîstikê ji lîstikvanên ser dikê dixwaze ku ew profesyonel bin. Lê di rastiyê de tiştekî wiha



ne guncaw e, ji lewra her yek ji bo debara xwe bike mecbûr e bi karekî re mijûl bibe û di demên xwe yên mayî de jî hewl didin di lîstikê de cih bigirin. Ji ber hejmara wan têrê nake her yek mecbûre di rola çend kesan de bilîze. Hin caran derhêner jî mecbûre rola karakterên ku nehatine marke bike û di cihê wan de bilîze. Ji xwe cihê wan jî jêrzemînek e, şanoya wan hatiye mohrkirin û ew mecbûr in bi dizî provayên xwe bikin. Kesekî bi navê Bextîyar ku li jêrzemînê radizê bi parola lîstikvanan digire hundir. Hin caran dema lîstikvan kêm bin, Bextîyar di dewsa wan de dibe lîstikvan û rola wan jî marke dike. Ez behsa ronahî û kesên ku teknîkê rast dikin nakim ji ber ev yek ji bo wan tiştên lûks in! Bifikirin ji bo vî tiştî jî kesekî ku bi kare elektrîkê re mijûl e soz daye ku were alîkariya wan bike lê ji ber karê wî derketiye ji dêvla xwe xwîşka xwe şandiye. Rewş wiha ye. Serpêhatî ev e. *-Ozgurpolitika*

Sudoku:Pirs 20

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | | | | 3 | 6 | | 9 |
| | 7 | | | | 4 | | | |
| 5 | 9 | | 8 | | | | | |
| | | | | 2 | 7 | 8 | 1 | |
| | | | 3 | | 9 | | | |
| | 4 | 5 | 6 | 8 | | | | |
| | | | | | 6 | | 9 | 2 |
| | | | 4 | | | | 3 | |
| 9 | | 1 | 2 | | | | 7 | 6 |

Sudoku: Bersiv19

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 8 | 2 | 4 | 7 | 3 | 5 | 6 | 1 |
| 4 | 1 | 3 | 6 | 2 | 5 | 9 | 7 | 8 |
| 7 | 6 | 5 | 9 | 8 | 1 | 4 | 3 | 2 |
| 2 | 7 | 8 | 5 | 4 | 9 | 6 | 1 | 3 |
| 1 | 5 | 9 | 8 | 3 | 6 | 2 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 4 | 2 | 1 | 7 | 8 | 5 | 9 |
| 3 | 9 | 6 | 7 | 5 | 8 | 1 | 2 | 4 |
| 8 | 4 | 1 | 3 | 6 | 2 | 7 | 9 | 5 |
| 5 | 2 | 7 | 1 | 9 | 4 | 3 | 8 | 6 |

## Quncika Têgînan

| Binpêkirin | Guhnedana qanûnan, yan jî bendên lihevkirinê. |
|---|---|
| Hevrê | Kesên ji bo têkoşînekê, ji bo pêkanîna fikrekî hevaltiya hev dikin. |
| Hempîşe | Kesên xwediyên heman karî: Wezîrê Çandê yê Çînê bi hempîşeyê xwe yê Amerîkî re rûnişt. |
| Hemser | Jin û mêrên hev. Hevalên hev yên jiyanê. |
| Hevsengî | Belavkirina selahiyeta hêzên siyasî, bi awayekî ku hev sînordar bikin: Berê Yekîtiya Sovyetan û Amerîka hebûn, hevsengiya dinyayê niha hatiye guhertin. |
| Hemşîre | 1. Kesên bi şîrekî mezin bûyîn.<br>2. Xwîşk.<br>3. Jinên li nexweşxaneyan li nexweşan dinêrin. |
| Pêşeng | Kesê nûnertiya hina dike; rêber, rêveber. |
| Pêşniyar | Ji bo çaresrkirina pirsgirêkekê diyarkirina fikrekî, teklîf. |
| Pêşwazî | Rûmetdayîna ji bo kesekî ji derve tê: Mêvanên xwe li ber derî pêşwazî kirin. |
| Polîtîka (Îtalî) | Diyarkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan. Siyaset. |

# `Gerîla xeta parastina gelên azadîxwaz temsîl dike`

Welatiyên bajarê Qamişlo êrişên dewleta Tirk yên kîmyawî yên li dijî qadên gerîla şermezar kirin û gotin, hedefgirtina Tevgera Azadiya Kurdistanê hedefgirtina tevahiya gelên Rojhilata Navîn e. ***R-4***



1`ê Mijdar`ê roja ...... Zekî Bedran R-5

1'Ê MIJDARÊ PÊNGAVA ... Dîlyar Cizîrî R-4

Bablekan Sîpan Şînda R-7

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1010 | 2-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# KOBANÊ BI RIHÊ ŞERÊ GELÊ ŞOREŞGERÎ BI SER KET




## ` 1`ê Mijdarê Serkeftina Şerê Gelê Şoreşgerî bû`

Rîhan Elo diyar ku Kobanê efsaneya berxwedanî û têkbirina paşverûtiyê ye û got, êrişên çeteyan yên ser Kobanê dewamiya Komploya Navneteweyî bû û ragehandina 1`ê Mijdarê (Roja Kobanê ya Cîhan) jî serkeftina Şerê Gelê Şoreşgerî bû ***R-4***



### QSD'ê: Berxwedana Kobanê li herêmê û cîhanê bû nirxekî mayînde

QSD'ê bi boneya 1'ê Mijdarê Roja Cîhanê ya Kobanê hemû şehîdên leheng bi bîr anîn û gelên cîhanê yên ku serî rakirin, daketin qadan û piştgirî dane berxwedana kobanê silav kir û got. berxwedana Kobanî nirxekî mayînde ye. ***R-3***

### Şervanên enternasyonalîst banga piştgiriya Şoreşa Rojava kirin

Şervanên enternasyonalîst ên YPG û YPJ`ê diyar kirin ku berxwedana Kobanê bi fedakariyên bi sedan şehîdan bi serkeftinê tacîdar bû û got in, em bang li hemû xelkê li cîhanê dikin ku piştgiriya şoreşa Rojava bikin. ***R-3***

## HPG: 4 dagirker hatin cezakirin



HPG`ê ragehand ku di çalakiyên hêzên wan de 4 leşkerên Tirk yên dagirker hatin cezakirin û konek jî hate îmhakirin. Herwiha HPG`ê da xuyakirin ku êrişên artêşa Tirk ya dagirker yên bi bombe û çekên kîmyewî dewam dikin.***R-3***

## Karkerên paqijiyê: Çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye



Karkerên paqijiyê yên Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo diyar kirin ku çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye. Herwiha gotin, em çiqasî paqij bikin jî, eger welatî bi me re ne alîkar bin paqijî çênabe û wê diyardeya avêtina çopê dewam bike. ***R-6***

## Jin li herêmên rizgarkirî aboriya xwe bi pêş dixe

R-2



# Jin li herêmên rizgarkirî aboriya xwe bi pêş dixe

Rêvebera projeyên Aboriya Jin li herêmên rizgarkirî Dûa El Hesen da zanîn ku armanca wan ya sereke pêşxistina jinan di warê aborî de ye û got, em hwil didin ku bi riya jinan aboriya herêmê pêş bixin û derfetên baş ji jinan re peyda bikin.

**Rojbîn Zagroz/Reqa**

Di şoreşa Rojava de di warê siyasî, çandî, civakî û aborî de jinan kar kir û bi ser ketin. Herwiha gelek berhem û afrîneriya jinan derket holê. Yek ji wan berhemên ku roleke avaker di nava civakê de dilîze, Aboriya Jinê ye.

Digel derfetên kêm, zihniyeta desthilatdar ya zilam û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, jinan di warê aboriyê de encameke baş bi dest xist û roleke girîng di si-



vikkirina aloziya aborî de lîstin.

Piştî şoreşa Rojava, jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji aliyê pêşxistina aborî ve pir xabat dan meşandin û aboriya civakê pêş xistin. Lewra jin mîna tovê jiyanê ye û her tişt li derdora wê digere. Tevî gelek zehmetî û astengiyan, ji aliyê aboriya jinê ve gelek gavên mezin hatin avêtin. Herwiha rewşên şer û ambargoyên ser herêmê de jî, hewceyî bi aboriya jinê heye. Bi keda jinê û berhemên wê yên baş, aboriya herêmê pêş dikeve.

Debarê beşdarbûna jinê di pêşeyên aborî de li herêmên rizgarkirî (Tebeqa, Reqa, Minbic û Dêrezorê), de Rêvebera projeyên Aboriya Jin li herêmên rizgarkirî Dûa El Hesen axivî û destnîşan kir ku sala 2014`an aboriya jinê hate avakirin û di 2015'an de jî Yekemîn konferansa aboriya jinê hate lidarxistin.

**`Armanc ew e ku jin di warê aborî de bi hêz bibe`**

Dûa li ser tevlîbûna jinê di warê aborî de û avakirina projeyên aborî wiha got: "Di destpêka şoreşê de endamên Kongreya Star li her herêmê ji xwe re kom ava kirin û bi rêya wan koman cihê xwe di komîn, meclîs û di nava civakê de girtin. Herwiha armanca wan ew bû ku projeyên aborî yên mezin bi rêya jinê bidin avakirin. Lewra ev proje sûdê dide jin û civakê. Jixwe armanca sereke ya van projeyan ew bû ku jin di warê aborî de bi hêz bibe û aboriya xwe xurtir bike."

Dûa da zanîn ku ofîsa Aboriya Jinê ji bo avakirina projeyên ku xizmeta jinan di civakê de dike, kar dike û axaftina xwe wiha domand: "Wek aboriya Jinê di van du salên dawî de, me gelek kar û xebat meşandin, taybet di milê çandiniyê de. Zeviyên ku me çandibûn jî, di navbera herêmên Kesrat û Tişrîn de bûn, herwiha li Tebqa, Minbic û li Dêrazorê jî zeviyên me yên çandiniyê hene. Tê de tevayiya



zebzeyên havîn û zivistanê hatîne çandin."

**`Em hwel didin bi riya jinan aboriya xwe pêş bixin`**

Dûa bîr xist ku ew çavdêriya gelek firûnan dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Yek ji firûnên ku em çavdêriya wê dikin, firûna nanê ya li aliyê Dêrezorê ye. Herwiha firûna nanê sêlê ya li Tebqa, Minbic û Reqayê ye. Jin di van firûnan de kedeke mezin dide. Jin ne li firûna nan û zeviyên çandiniyê tenê, li her deverê cihê xwe diyar kiriye û xebateke baş dike. Wek Aboriya jin jî em bi tevayiya derfetên xwe hewl didin derfetên kar ji jinan re peyda bikin. Lewra di dema dawî de ji ber êrişên dagîrkeriyê û kiryarên ku li ser herêmên me tên kirin, aboriya me lawaz bû. Ji bo wê jî em hwil didin ku bi riya jinan, aboriya xwe pêş bixin û derfetên baş ji jinan re peyda bikin. Da ku jin destê xwe li ber mêr veneke û aboriya xwe bi xwe bide meşandin."

**`Jin dikare her perojeyê bi rêve bibe`**

Dûa behsa zehmetiyên ku jin di kar û di vekirina projeyan de dikşînin, kir û wiha got: "Destpêkê me ji ber zîhniyeta mêr ya serdest pir zehmetî dikşand. Lewra digotin; 'hun jinin, çawa dikarin projeyan ava bikin û kargehên mezin vekin!'. Lê, bi hêz û îradeya xwe me ji her kesî re da xuyakirin ku jin dikarin her karî bikin û bi ser bêxin. Lewra dema jin bixwaze, dikare her tiştî bike. Îro jin ne li qadên civakî tenê, li qadên siyasî, dîplomasî û leşkerî jî rêveberiyê dikin. Ji bo wê jî, jin dikare her projeyê bi rê ve bibe. Wek jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, me ev zehmetî derbas kirin û me hewl da wekheviyekê di navbera jin û mêr de çêkin."

**`Emê projeyên xwe berfirehtir bikin û projeyên nû ava bikin`**

Dûa têkildarê plan û projeyên paşerojê de jî got, wek Aboriya jin em hewl didin ku karê xwe zêde bikin û projeyên xwe berfirehtir



bikin. Hem projeyên sewaldariyê, çandiniyê û firûnan, hem jî yên xizmetguzariyê hatîne plankirin. Lewra projeyên wisa, aboriya civakê xurt dikin û alîkariya civakê dike. Herwiha em hewl didin ku projeyên nû ava bikin û kargehên nû vekin.

Dûaa got, berhemê projeyên ku aboriya jin li ser wan dixebite, di nav bazarê de tên firotin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Em tevayiya berhemê projeyên yên weke zebze, nanê sêlê û nanê alî, li bazaran difiroşin û bi pareyên wan, projeyên nû vedikin."

Rêvebera Aboriya Jinê li herêmên rizgarkirî Dûa El hesen, di dawiya axaftina xwe de got, em hewl didin jinan di warê aborî de bi hêz bikin û rola wan di civakê de xurt bikin. Herwiha dive jin jî bawerî bi xwe bê û ji niha wê de jiyana nava çar duvaran qebul neke û bizanibe ku karkirina wê, wê bibe sedemê guhartina hijmendiya paşverû.

# Banga 'Meşa Mirovahiyê': Divê rê li ber lêkolînê bê vekirin

**Parlementera HDP'ê Mûazzez Orhan Işik ku ji bo meşa ber bi Silopiyayê ve ya li dijî bikaranîna çekên kîmyewî bang kir û xwest ku rê li ber lêkolînkirinê bê vekirin.**

Dê di 6'ê Mijdarê de li dijî bikaranîna çekên kîmyewî yên ji aliyê Tirkiyeyê ve li Zap, Avaşîn û Metînayê tên bikaranîn bi dirûşmeya "Li dijî çekên kîmyewî meşa mirovahiyê" bê lidarxistin. Gelek rêxistinên civak sivîl û partiyên siyasî piştgiriya vê meşê dikin. Parlementera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Wanê Mûazzez Orhan Işik û Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Mûstafa Avci ku qeyûm tayinî şûna wî hatiye kirin ji bo meşê bang kirin.

**'Em nikarin xwe li bêdengiyê deynin'**

Orhan, destnîşan kir ku bikaranîna çekên kîmyewî sûcê li hemberî mirovahiyê û şer e û got: "Ev yek li gorî hemû peymanan sûcê li hemberî mirovahiyê ye. Ger daneyên bi vî rengî hebin, nexwe divê hemû kesên dibêjin 'em mirov in' bêdeng nemînin. Saziyên navneteweyî jî ji b nebin lirîkê vî sûcî demildest divê li herêmê lêkolînan bikin."

**Bangewazî**

Orhan, ji bo beşdarbûna meşa li Silopiyayê bang hemû kesên aştîxwaz kir û wiha berdewam kir: "Em bang li hemû gelan, demokrasîxwaz, mirovhez, jiyanhez û dijberên şer dikin ji bo piştgiriya meşê bikin. Desthilat li xwe mukur nayê ku çekên kîmyewî bi kar aniye. Made ne rast e, nexwe çima kesên ji bo vê bang dikin tên binçavkirin û girtin? Zanyarekê xwest heyetên serbixwe vê yekê vekolin, lê demildest hat binçavkirin û girtin."

Orhan, bi lêv kir ku desthilat dixwaze ser rojeva çekên kîmyewî bigire û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Kesên doza heqîqetê dikin tên tepisandin. Ên polîtîkayên şaş ên desthilatê rexne dikin û li dijî şer ra divin tên tepisandin. Ya ku divê bê kirin ew e ku pêşî li ber heyetên serbixwe bê vekirin. Her wiha desthilat jî divê piştgiriya van lêkolînan bike. Lewma em jî ji ber fikarên rû didin û ji bo bidawîbûna




vî şerî jiyanê diparêzin. Em bang li hemû derdorên hestiyar dikin ku 'li dijî mirinê jiyanê biparêzin.'"

**'Bila lêkolîn bên kirin'**

Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Wanê Mûstafa Avci ku qeyûm tayinî şûna wî hatiye kirin anî ziman ku bi vê meşê dixwazin balê bikişînin ser bikaranîna çekên kîmyewî û got: "Li gor peymanên navdewletî bikaranîna çekên kîmyewî sûc e. Em bang li wan jî bikin. Bila li gor biryarên hatin dayîn tevbigerin."

Avci bang li her kesî kir ku li dijî bikaranîna çekên kîmyewî dengê cwe bilind bikin.

***MA***



# Xelata xwe diyarî gelê Rojava kir

Derhênera Îtalyayî Benedetta Argentîerî xelatê ji Mîhrîcana Fîlmana Kolnê ya 32'an de girtî diyarî Rojava kir û got, Ez vê xelatê diyariyê gelê wêrek ê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikim.

**Navenda Nûçeyan**

Di Mîhrîcana Fîlman a Kolnê ya 32'an de, di 6 beşê cuda de xelat tên dayîn. Benedetta, bi belgefîlma xwe ya bi nave "The Matchmaker" Xelata Phoenîx wergirt.

Benedetta Argentîerî merasîma dayîna xelatan de wiha axivî: "Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi pêşengiya Kurd, Ereb, Asûrî û jinan civakeke nû ya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaz ya bi pêşengiya jinan tê avakirin. Civaka nû hêdî hêdî bi pêş de diçe û em hemû jî bi vê civakê re hînê tiştan dibin. Ew li dijî DAÎŞ'ê têkoşiyan. Ji bo Ewropayê li ber DAÎŞ'ê rabûn. Ji bo Xweseriya Demokratîk ne hêsan bû. Ew, di rewşeke ku dewleta Tirk, her roj welatiyan, bi taybetî jinan bi dronean qetil dike de, tekoşîna xwe bi israr didomînin. Divê mirov ji bîr neke ku parastina vê projeyê ku wê Rojhilata Navîn pê biguhere û wê piştî ewqas şer aştiyê bîne, pir girînge. Lewma ez jî bi vê boneyê vî xelatî diyariyê wan mirovên wêrek ên li wir dikim."




# Bi rêya wêneyan xwe nas kir

**Lîloz Hecî di 6 saliya xwe de dest bi xêzkirina wêneyan kir. Dibêje ku wê bi wêneyan jiyan û hunera xwe keşif kiriye.**

**NÛJIYAN ADAR/ANF/Qamişlo**

Lîloz Hecî dibêje ku wêne ji bo wê jiyan e. Wêneyên ku di 6 saliya xwe de dest bi çêkirina wan kir, weke hişê dîrokê pênase dike.

Lîloz a li Dêrikê, di 14 saliya xwe de hunera xwe bi rengekî profesyonel nîşan dide. Lîloz dibêje, "Nêrîna her mirovî cuda ye, cîhana xwe cuda ye. Min xwe bi wêneyan keşif kir. Min nêrîna Lîloz a li jiyanê di wêne de dît. Ya rast wêne şêweyekî vegotina xwe ye. Bi wêne min qala lêgerîn, daxwaz, hestên xwe kir. Min bi rêya wêne xwe civakî kir, bi civakê re têkilî danî."

Lîloz ku bi xwe hînî xêzkirina wêneyan bû wiha axivî: "Kesî berê min neda çêkirina wêne, yan jî kesî negot bibe wênevan. Min bi xwe rahişt kaxiz û pênûsê û dest bi xêzkirinê kir. Bi taybetî xêzkirina çav, bala min dikişand. Ya ku mirovan nîşan dide çav e. Ya rast rêya xwegihandina mirovan, xwegihandina wateyê û hîskirina wê, çav e. Pêvajoya ku bi xêzkirinê destpê kir, min gihand vê astê."

Lîloz radigihîne ku ew bi gelek cûreyan wêneyan xêz dike û destnîşan dike ku divê huner ji nifşan bigihêje nifşên nû.

Lîloz tevî ku nû dest bi perwerdekirinê kiriye, di nava 2 mehan de 5 şagirt gihand û niha 5 şagirtên wê hene ku 4 jê jin in. Lîloz îsal dest bi perwerdekirina mirovên 13 salî û yên jê mezintir kir. Qala biryara xwe ya li ser perwerdekirinê wiha dike: "Huner zindîkirina hiş û dîrokê ye. Ya ku serdemê baş tîne ser ziman huner e. Dîroka gelekî bi rêya hunerê digihêje nifşên nû. Hebûna wênevanekê-î dibe ku zêde ne bi wate be, lê belê hebûna gelek wênevanan dikare hunereke xurt biafirîne. Mirov bi parvrekirinê dijî. Vegotin û hînkirin nîşaneya têgihiştinê ye, mirovan mezin dike. Gihandina hunerê ji civakê re nîşaneya serketinê ye. Ez ji ber vê girîngiyê didim perwerdeyê. Parvekirin ji bo min cihê kêfxweşiyê ye."

Lîloz diyar dike ku wêne ji bo perwerdekirina civakê hunereke pêşketî ye û dibêje, "Nêrîna mirovan a li jiyanê bi hunerê dikare bê guhertin. Mirov hunerê dikarin weke armanca perwerdeyê binirxîne. Huner ji bo zanekirin û têgihiştina civakê û gel dibe ku



kêrhatî be."

Lîloz şoreşeke ku hunera xwe bi pêş nexistiye weke avahiyeke bê bingehê pênase dike û dibêje, "Bi Şoreşa Rojava re gelan gelek destketî bi dest xistin. Lê, heta ku destketî xwe nespêrin çand û hunerê, encamên xurt bi xwe re naîne. Aliyê herî girîng ewe ku Şoreşa Rojava bi huner xwe bi bihune. Heta niha gelek gavên girîng hatin avêtin, lê belê ji bo şoreşê têrê nake. Divê eleqeya ji bo hunerê û hunerhezan zêdetir be."

Wênevan Lîloz Hecî bi berhemên xwe tevlî pêşangehan jî dibe.

# 'Nameyên ji Şengalê' serpêhatiya Şengalê vedibêje

**Filma bi navê "Nameyên ji Şengalê" ku ji aliyê Produksiyona Nûjiyan ve hatiye çêkirin û derhêneriya wê ji aliyê Dersîm Zêrevan ve hatiye kirin, derdikeve pêşberî temaşevanan.**

Amadekariya filmê ji 2018'an ve destpêkiriye û dê di roja rizgarkirina Şengalê ango di 13'ê Mijdarê de dê bê nîşandan. Filma "Nameyên ji Şengalê" ji 6 beşan pêk tê û di her beşê de nameyek tê xwendin. Bi van nameyan û dîmenan êş û azara Şengal kişandiye tê vegotin. Film li Festîvala Filmên Kurdî ya Londonê jî hatibû nîşandan.

Têkildarî filmê çêker û lîstikvana sereke ya filmê nihêrînên xwe anîn ziman.


Endama Komîna Film a Rojava û her wiha çêkera "Nameyên ji Şengalê" Sevînaz Evdikê diyar kir ku armanca sereka ya çêkirina vî filmî nîşandana serpêhatiya Şengalê ya ji cîhane re bû û got; "Çiyayê Şengalê devereke pirr asê ye û heya niha kes zû bi zû ewder bidest nexistiye. Civaka Êzidî heya niha bi 74 fermanan re rû bi rû maye. Herî dawî jî bi destê şervanên Kurd pêşî li fermana qirqirina Êzidiyan hat girtin. Ji ber wê şansê me çêbû ku em vê serpêhatiyê bi riya filekî bînin ziman. Ji lewma di her beşeke film de ango bi her xwendina nameyekê serpêhatiya Şengalê tê vegotin.

**Civak xwe li wir bi rêxistin kiriye**

Lîstikvana sereke ya filmê Rozan Mistefa jî der barê rola xwe ya di filme de axivî û wiha behsa serpêhatiyên xwe kir, "Di dema şerê li Şengalê de ez şervanek bûm. Tevlî pêngava rizgarbûna Şengalê bûm. Mi di wê pêvajoyê de gelek tişt dîtin. Piştî Şengal rizgar bû vê carê ji bo film em vegeriyan. Dema min dît civaka me xwe li wir bi rêxistin kiriye û ewder bi rêve dibin ez pirr kêfxweş bûm."

**Dayikek, şervanek û 12 siwarî**

Rozan Mistefa di derbarê filmê de ev agahî jî dan; "Ji dervayî min dayikeke ji Şengalê û şervanek bi navê Elî jî heye di film de. Rola me her sêyan cuda bû. Rola dayikê ewe ku hêvî, bawerî û azadkirina Şengalê temsîl bike û di nameyan de vê rolê pêk tîne. Ez jî rola wê şeravana jin ya ku ji serê şer û heya dawiya şer ji Şengalê derneket û her tim bi gel re bû dilîzim. Wê heta dawiyê gelê Êzidî parast û li ber




xwe da ji lewma jî gelê Şengalê pirr jê hez kiribû û qîmet didayê. Me xwest em keda wê şervanê nîşan bidin. Her wiha Elî jî ji rêveberê 12 siwariyan e. Ew siwariyên ku ji bo şengalê hatibûn. Ew siwarî jî hêz dane gelên Şengalê û piştevaniya wan kirin."

***JINHA***



## Bablekan

**Sîpan Şînda**

**Bablekan bablekan e, hê werinê bablekan e**

Çanda Kurdî bi taybetî di warê çand û hunera gelerî de, gelekî dewlemend e. Tu diçî kîjan herêmê tu xeml û rengên cuda dibînî. Dawetên herêman cihê ne, reqsa wan cihê ye, govend û dîlanên wan cihê ne, şîna wan cihê, cil û bergên wan cihê ne, irf û edeten wan cihê ne û hwd. Lê ev cudahî ne qelsî ye, berovajî vê dewlemendî ye. Dewlemendiya netewî û civakî ye. Lê belê neyar vê cudahiyê weke qelsiyekê li hemberî Kurdan bi kar tîne. Bes di Kurdî de gotinek heye, dibêjine "tu karê xwe bike bila ew jî weke kûçika bireyî".

Tu biçî kîjan herêma Kurdistanê her yekê dîlan û govendên xwe yên xweser hene. Yek ji van herêmên ku ji aliyê folklora gelêrî ve gelekî dewlemend, herêma Botan e. Botan, ne tenê warê mîr û bega ye, herweha li Bakûrê Kurdistanê cihê ku kevneşopiyên Kurdewariyê herî zêde lê hatîne parastin e ji. Çi di warê dengbêjiyê de be, çi di warê cil û bergên Kurdî de be, çi di irf û edet û parastina nirxên Kurdî de be li Bakûr, Botan serkêşiyê dike. Dawetên Bota gelekî bi keyf û şahî ne. Yek ji van dawetên ku li herêma Bota tê lîstin, Bablekan e. Daweta Bablekan ,taybetmendiyeke xwe ya xweser heye. Daweteke gelekî bi coş û estetîke. Û ew ne bi meqamekê tenê ji tê kirin. Bablekan di daweta de ne dîlana destpêkê ne jî di ya nêvê de tê kirin. Dema dibêjine 'emê navbera firavînê bidin' tê kirin û êvarî ji beriya dawet biqede tête kirin. Niha bablekan li gelek deveran tê kirin, lê mixabin ew ne bablekan e, lûtlekan e!

Bablekana resen ya li milê Botanê tê kirin, gelekî bi estetîke. Di vê dîlanê de, bi 'tiliya qulîçkê' destê hev digirin; bi lingê çepê dest pê dike û sê gava pêşve diçe (çep-rast-çep) û paşê ji dîsa sê gava pajve tê (dîsa çep-rast-çep). Di dema paşveçûnê de, herdu ling dibin cot û carekê kovik tên çemandin. Dest jî li gorî rîtma xwe digerin. Yên vê dîlanê dikin, li gorî zanabûna xwe estetîka dîlanê xweş dikin. Bi taybetî ji sergovendî û bingovendî dema bablekanê dilîzin, mirov her mirêkare ku seyra wan bike.

Pêşiyê strana bablekan di miqamê giran tê gotin. Paşê stran sivik dibe û miqamê dîlanê bi lez dikeve. Dîsa nerm dibe û dîsa sivik dibe. Piştre strana Gulê Gulê tê gotin û dawetê tam bi kelêjan têxe. Paşê ji strana Hoy Rêbîno dide ser û ev miqam dîlanê nermtir dike.

Strana Bablekan bi xwe bi serê xwe straneke pirr reng e. Aliyekî wê jî şer, têkçûn û nav li xwe dayîne.

Bablekan berde bezî, şêrê sor berde bezî
Bî şerê xal û xwarzî, bî şerê mam û birazî
Xal û xwarzî kî ji wa ne, mam û birazî kî ji wa ne
Şêr in ji malê şêra ne, mêr in ji malê mêra ne

Aliyek yê wê bi motîfên oldariyê hatiye hûnandin:

Bablekan bablekan e, şêrê sor bablekan e
Sibehî Remezan e, du sibe îda haciya ne

Aliyek yê wê mêranî, mêrxasî û pêlewanî ye:

Bablekan kurê pîrê şêrê sor kurê pîrê
Bû piling û ket bîrê, bû piling û ket bîrê
Malik lê çû Cizîrê malik lê çû Cizîrê

Lê mixabin kesên ku vê dîlanê diha lê didine û strana wê dibêjine pirrê wan yan nizanine bêjin, yan jî hema heyaleyî û bi awayekî hûlganî lê didine. Him dawet xirakirine û him jî stran ji hev peritandine.

# Karkerên paqijiyê: Çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye

Karkerên paqijiyê yên Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo diyar kirin ku çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye. Herwiha gotin, em çiqasî paqij bikin jî, eger welatî bi me re ne alîkar bin paqijî çênabe û wê diyardeya avêtina çopê dewam bike.

**Darîn Silê/Qamişlo**



Paqijî çand û exlaqê civakê ye, lewma herî zêde jî civakê eleqedar dike. Karkerên paqijiyê jî dibêjin, pêwîst e civak parastina paqijiya herêma xwe bike û li paqijiya jîngehê baldar be. Bi taybet di milê avêtina çopê de divê welatî baldar bin û çopê biavêjin cihê selikên çopê ku belavî derdor nebin.

Komkirina çopê yek ji karên herî girîng yê dijwar e, herwiha parastina çanda paqijiyê ye. Li bajarê Qamişlo rojane erebeyên çopê û karkerên Paqijiyê yên Şaredariya Gel ya Qamişlo ji serê sibeha zû ve li nava tax û kolanên bajêr digerin, da ku çopa ber deriyê malan û ya li kolanan kom bikin. Tevî ku erebe digere û li her taxê jî selikên çopê hene, dîsa jî piraniya welatiyan çopê danaynin cihê wê yê guncaw û diavêjin devê deriyê male. Ev jî dibe sedem ku çop li derdorê belav bibe û çareke din karkerên paqijiyê çopê kom bikin.

Derbarê rewşa paqijiyê li Qamişlo û kar û xebata karkeran ya komkirina çopê, karkerên Şaredariya Gel yên bajarê Qamişlo ji me re axivên û dan zanîn ku ew sibaha zu heya êvarê çopa ku li derdor hatiye belavkirin kom dikin, lê dîsa jî gemera derdor xilas nabe.

Karkerê paqijiyê yê bi navê Telal Mihemed ku 3 sal in karê paqijiyê dike, da xuyakirin ku li bajar û navçeyên herêma Cizîrê ji aliyê paqijiyê ve guhartineke berçav heye û got, ji bo paqijiyekê demdor hê jî kar û xebat jê re pêwîst e. Da bihêjin çareseriyekê ku tevayiya pirsgirêkên jîngehê yên li herêmê bi dawî bibin.

Telal got, Em ji saet 6`ê sibehê ve de dest bi kar dikin, heta duduyê piştî nîvro. Hin caran jî ji ber ku çop li kolanan belave ye, em di komkirina wê de dereng dimînin. Ji bo wê jî em karê xwe dereng diqedînin.

**`Pêwîste her kes serê sibehan çopa xwe amade bike`**

Telal bal kişand ser kesên ku çopa xwe datînin devê deriyên xwe û axaftina xwe wiha domand: "Kesên ku êvaran çopê datînin ber deriyên xwe û li hêviya erebeya çopê dihêlin, bi şevê heywan wê çopê tev li kolanê belav dikin û ev dibe sedema ku qirêjî li nava bajêr çêbibe û karê me jî girantir bibe. Ji bo wê jî, pêwîste her kes danê sibehan, berî ku erebe li nava kolanan bigere çopa xwe amade bike, da ku dema erebe digere wê çopê kom bike."

Telal bîr xist ku şaredariyê, berî demekê gelek selikên çopê li nava bajar belav kirin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Şaredariya Gel ya Qamişlo li her taxê û li kolanên sereke, gelek selikin çopê danîne. Pêwîste her kes çopa xwe bixe van selikan, da ku çop li kolabnan belav nebe û karê me jî girantir nebe."

**`Parastina paqijiya bajar ne erka me tenê ye`**

Telal da zanîn ku rola welatiyan di parastina paqijiya bajêr de pir girîng e û wiha dirêjî da axaftina cxwe : "Parastina paqijiya bajar ne erka me tenê, erka her kesî ye. Divê welatî bi me re alîkarbin. Çimkî yên ku li vî bajarî dijîn ne tine emin, her kesê ku di vî bajarî, di vî walatî de dijî berpirsyarê pakijiya wî bajarî û wî walatiye. Em jî ji bo paqijiya bajarê xwe û walatê xwe kar dikin. Ji bo wê jî pêwîste em tev li paqijiya bajarê xwe xwedî derkevin. Paqijî exlaq û çanda civakê ye. Çawa ku welatî parastina paqijiya malên xwe dikin, divê di heman demê de parastina kolanên bajarê xwe jî bikin. Lewra çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye. Em çiqasî paqij bikin jî, eger welatî bi me re ne alîkar bin paqijî çênabe û wê diyardeya çopê dewam bike."





Telal behsa kesên ku li nava çopa digerin kir û got, dema dawî ev diyarde zêde bûye. Ev pirsgirêka herî mezin e. Çimkî ev kes komkirina çopê ji xwe re wek karekî dibînin û rojane di nava çopa kolanan de digerin, tişta ji wan re pêwîst kom dikin û çopa heyî belav dikin û tev li erdê dihêlin. Ji bo wî jî, dema em li kolanan digerin em bi saetan çopa li erdê kom dikin. Ev jî astengiyan ji dixe karê me de.

**`Bi hevkariya welatiyan wê pirsgirêka çopê çareser bibe`**

Telal di dawiya axaftina xwe de got, Em ji bo avakirina welatekî paqij û bi ewle kar dikin. Tevî ku karê me pir giran e, em hewl didin parastina paqijiya bajar bikin. Bi hevkariya welatiyan wê pirsgirêka çopê çareser bibe.

**`Derxistina çopê di demên diyarker de, dê pêşî li pirsgirêka me bigire`**

Ajokarê erebeya çopê Enes Yûsif Xelîl jî behsa astengî û zehmetiyên ku di dema kar de bi wan re derbas dibin kir û wiha got: "Gelek caran em bi saetan li ber hin malan disekinin, heta ku çopê derdixin. Tevî ku em stranan pêdixin, da ku agahdar bibin û çopê derxînin. Lê dîsa jî dereng dimînin. Hin jê bi şevê çopê datînin devê deriyê xwe û heywan wê çopê tev belav dikin, em jî neçarin bi saetan bisekin da ku kom bikin. Ev yek bandorê li erebeyê dike, lewra erebe bi saetan pêxistî dimîne û dibe sedema ku hin caran erebe xirab bibe."

Enes yûsif Xelîl di dawiyê de got, hevkariya welatiyan bi me re û derxistina çopê di demên hatîn diyarkirin de, dê pêşî li pirsgirêkên me bigire. Ji bo wê jî em bihêvîne welatî di vî alî de bi me re alîkarbin û çopa xwe di dema ku erebeya çopê digere de derxînin.

# Xelk dijî bihayê neftê nerazîne

**Welatiyên navçeya Soran û Rewandizê diyarkirin ku ew nikarin bi bihayê hikumetê diyarkirî, neftê werbigrin û gotin, Divê xelk dijî vê helwestek cidî nîşan bide, ji ber xedrek mezine.**

Piştî Wezareta Çavkaniyên Xwezayî biryar da ku li herêmên çiyayî wê neft were belavkirin û her 200 lître wê bi 102 hezar û 500 dînar were firotin, welatiyan nerazîbûna xwe nîşandan. Xelk dijî biryarê nerazîne û dibêjin, hikumeta Iraq bi bihayê



30 hezar dînar neft ji bo Herêma Kurdistanê şandiye.

Welatiyên navçeya Soran û Rewandizê derbarê mijarê de ji



Rojnews re axivîn. Welatiyê binavê Rêbwar Mistefa diyarkir ku biryara wezaretê dijî xelkêye û dijî welatiyan suce. Rêbwar got; "Ji ber ku xelk nikare bi vî bihayî neftê bikire, ji ber ku hikumeta Iraqê gelek bi erzanî neftê ji herêmê re şandiye. Ji bo vê nabe biryar were qebûlkrin û em vê biryarê red dikin. Ger wisan be wê bi hezaran welatî nekaribin neftê werbigrin. Pêwîstiya xelkê Soran her zivistan bi zêdetirî du bermêlan heye, ev jî barê xelkê giran dike."

Welatiyê bi navê Ziryar Rehman ku xelkê Rewandize, li ser heman mijarê axivî û got; "Bihayê ku Hikumeta Herêmê dibêje, ne raste, biryara hatî dayîn suce û xedreye, divê xelk vê biryarê red bikin. Bang li xelkê Soran û Rewandiz dikim, vê biryara hikumetê red bikin û vî pereyî nedin. Hikumeta Herêmên ti xizmetek ji bo welatiyên xwe pêşwazî nake, başe wê xelk çawa bikare bi vî awayî jiyan bike. Zivistan zehmete, ji bo vê pêwîste xelk dijî vê biryarê helwestek nîşan bidin."

***ROJNEWS***



# QSD'ê: Berxwedana Kobanê li herêmê û cîhanê bû nirxekî mayînde

**Navenda Nûçeyan**

QSD'ê bi boneya 1'ê Mijdarê Roja Cîhanê ya Kobanê hemû şehîdên leheng bi bîr anîn û gelên cîhanê yên ku serî rakirin, daketin qadan û piştgirî dane berxwedana kobanê silav kir û got. berxwedana Kobanî nirxekî mayînde ye.




Bi boneya 1`ê Mijdarê (Roja Kobanê ya Cîhanê) Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) daxuyaniyek da. QSD`ê di daxuyaniya xwe de hemû şehîdên leheng bi bîr anîn û gelên cîhanê ji Kurdistanê heta Efganistan, Arjantîn û hemû welatên cîhanê yên ku serî rakirin, daketin qadan û piştgirî dane berxwedana şervanên wan silav kir.

QSD`ê diyar kir ku çeteyên DAIŞ`ê serkeftina xwe li ser artêşên herêmî yên ku li gel wan hemû sedemên madî yên berxwedanê hene, ferz kir û got: "Şervanên me bi sînga xwe ber bi tankên dijmin ve diherikîn û xwe diteqandin da ku wan rawestîne, ji ber ku çek û cebilxaneyên pêwîst ji bo rawestandin êrişa berfireh a DAIŞ`ê têrê nedikir. Îradeya jiyan û berxwedanê ya li gel şervanên me ji hemû çek, komplo û desteka herêmî ya ji bo DAIŞ`ê mezintir bû."

QSD`ê da zanîn ku berxwedana Kobanê bi ketina nava kûrahiya xwe ya navneteweyî ya ku li gorî fedakariya rêhevalên wa ye, qonaxeke nû ya têkilî û yekitiyê di navbera hemû gelên xwedî ziman û baweriyên cuda de ava kir û wiha got: "Berxwedana Kobanê bêhêviya gelek aliyên ku di têkbirina DAIŞ`ê de bi bin ketin, rakir û nirxên mirovî, azadî û dilovahî parast. Ji ber vê yekê tevgera navneteweyî, ya gel û fermî dengê berxwedanê û wefadariya bi xwîna pak a ku li ser zinar û deştên Kobanê hatin rijandin, veda û bû destpêka bidawîbûna rêxistina DAIŞ a terorîst."

QSD`ê da xuyakirin ku parastina Kobanê parastina mirovî û şoreşa jinan bû ya ku ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir û ji jinên tevahî cîhanê re bû îlham û rewşa gelekan guhert.

QSD`ê diyar kir ku piştî derbasbûna 8 salan di ser ragihandina Roja Cîhanê ya Piştgiriya Kobanê, hîna gef li herêmê tên xwarin û got: "Careke din em soz dikin ku em ê herêmên xwe, di serî de Kobanê ji her gefan, çi DAIŞ be an jî alîgirên wê biparêzin."

# HPG: 4 dagirker hatin cezakirin

**Navenda Nûçeyan**

HPG`ê ragehand ku di çalakiyên hêzên wan de 4 leşkerên Tirk yên dagirker hatin cezakirin û konek jî hate îmhakirin. Herwiha HPG`ê da xuyakirin ku êrişên artêşa Tirk ya dagirker yên bi bombe û çekên kîmyewî dewam dikin.

Derbarê şerê li li Zap, Metîna û Avaşînê , Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiyên bi bandor ên tîmên wan yên gerok de ; 4 dagirker hatin cezakirin, konekî leşkerî hat îmhakirin. HPG`ê di daxuyaniya xwe de ragehand ku artêşa Tirk a dagirker Qadên Berxwedanê 4 caran bi bombeyên qedexekirî û 8 caran jî bi çekên kîmyewî bombebaran kir.



HPG`ê diyar kir ku di 30'ê Cotmehê de li Qada Berxwedana Sacayê dagirker ji aliyê tîmên wan yên gerok ve bi taktîka sûîqestê hatin gulebarankirin û dagirkerek hate cezakirin. Herwiha di 31'ê Cotmehê de dagirkerên li Qada Berxwedanê Çemçoyê ji aliyê tîmên wan yên gerok ve bi çekên giran hatin gulebarankirin û 3 dagirker hatin cezakirin.

HPG`ê da xuyakirin ku di 31'ê Cotmehê de li Qada Berxwedana Girê Cûdî ya dagirker ji aliyê tîmên wan yên gerok ve bi çekên giran hatiye lêdan û konekî leşkerî hate îmhakirin. Di 31'ê Cotmehê de çeperên şer ên Şehîd Serxwebûn ên li Qada Berxwedanê ya Çemço 3 caran, çeperên şer ên Şehîd Xursî yên li Qada Berxwedanê ya Sacayê jî carekê bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin.

HPG`ê da xuyakirin ku di 31'ê Cotmehê saet di navbera 08:00 û 16:00'an de çeperên şer ên Şehîd Bahoz ên Qada Berxwedanê ya Çemçoyê 8 caran bi çekên kîmyewî hatiye bombekirin. Di heman demê de di navbera saet 13.00-13.30'an de dagirkeran madeyên plastîk û lastîkên wesayîtan şewitandine û dûmana jehrê bi aspiratoran arasteyî hundirê çeperên şer kirine.Di 31'ê Cotmehê de Qadên Berxwedanê yên Saca û Kurojahro, Girê Cûdî û Girê Amediye 42 caran bi helîkopterên êrîşê hatin bombekirin.

HPG`ê ragehand ku di 31'ê Cotmehê de Qadên Berxwedanê yên Çemço û Girê Cûdî bi dehan caran bi obus, tank û çekên giran hatin bombekirin. Herwiha di 31'ê Cotmehê de artêşa TC'ê ya dagirker bi kepçeyan hewl da çeperên şer ên li Qada Berxwedanê ya Karker hilweşîne."

# Şervanên enternasyonalîst banga piştgiriya Şoreşa Rojava kirin

**Navenda Nûçeyan**

**Şervanên enternasyonalîst ên YPG û YPJ`ê diyar kirin ku berxwedana Kobanê bi fedakariyên bi sedan şehîdan bi serkeftinê tacîdar bû û got in, em bang li hemû xelkê li cîhanê dikin ku piştgiriya şoreşa Rojava bikin.**

Bi boneya Roja Kobanê ya Cîhanê Şervanên enternasyonalîst yên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) daxuyaniyek dan .

Şervanên enternasyonalîst di daxuyaniya xwe de diyar kirin dema DAIŞ`ê êrişî Sûriyê û Iraqê kir, bi bin neket. Leza ku pê bajarên mezin mîna Reqa û Mûsilê kontrol kiriye, cîhan şaş kir. Kesek bawer nedikir ku bajarekî biçûk mîna Kobanê li hember wê rêxistinê li ber xwe bide ku bi hezaran cîhadiyên biyanî û alavên leşkerî yên nûjen ku her du artêşên Sûriyê û Iraqê dev jê berdane, êrişî bajêr kir.Gel pêşengiya berxwedana Kobanê kir. Jin, mêr, dayik û ciwanên Kobanê dev ji bajarê xwe berneda. Jinan roleke pêşeng di vê berxwedanê lîst. Arîn Mîrkan canê xwe feda kir da ku nehêle tankên DAIŞ`ê derbasî bajêr bibin û bû sembola jinên azad."

Şervanên enternasyonalîst dan zanîn ku gelek kes bi dildarî ji seranserî cîhanê tevlî berxwedana Kobanê û YPJ û YPG`ê bûn û wiha gotin: "Şehîdên enternasyonalîst mîna Gelhat Rûmêt, Mezlûm Aktaş, Karker Kobanê, Yaramaz Kilizbaş, Sarya Îlîm Denzî, Rojvan Kobanê û Pirsûs Armanc di oxira parastina gelê Kobanê de şehîd bûn. Pabendîbûn û fedakariyên wan ji bo me hemûya jêdera îlhameke mezin e. Piştî ewqs mehên berxwedanê alên YPJ û YPG`ê li şûna ala terorê careke din bilind bû. Fedakariyên bi sedan şehîdan bi serkeftinê tacîdar bû."

Şervanên enternasyonalîst diyar kirin ku divê bîranîna şehîdan bên parstin da ku bajarê Kobanê careke din nekeve û wiha demandin: "Gelek ji me cara yekemîn piştî xwepêşandanên giştî li cîhanê ji bo Kobanê, navê Rojava bihîst.



Li seranserî cîhanê li hember xemsariya dewletên rojavayî xwepêşandan li dar ketin û piştgiriya berxwedana destanî ya Kobanê kir. Kobanê di têkoşîna ji bo cîhaneke baştir de bû hêvî. Divê cîhan careke din piştgiriya xwe bi Kobanê re li gel êrişên heyî, rave bike."

Şervanên enternasyonalîst yên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) di dawiya daxuyaniya xwe de bang li hemû xelkê li cîhanê kirin ku di 1`ê Mijdarê de piştgiriya wan bikin, dakevin kolanan û piştgiriya şoreşa Rojava bikin.

# `Gerîla xeta parastina gelên azadîxwaz temsîl dike`

Welatiyên bajarê Qamişlo êrişên dewleta Tirk yên kîmyawî yên li dijî qadên gerîla şermezar kirin û gotin, hedefgirtina Tevgera Azadiya Kurdistanê hedefgirtina tevahiya gelên Rojhilata Navîn e.

**Şaho Gabar/ Qamişlo**

Dewleta tirk ya dagirker, ji bo ku gelê Kurd qir bike ji her alî ve êrişî Kurdan dike. Herî dawî êrişên xwe yên bi çekên kîmyawî yên li dijî qadên gerîla zêde kirin e. Li hemberî van êrişên hovane, hêzên gerîla derbeyên giran li artêşa Tirk ya dagirker didin. Herwiha bertekên şermezarkirinê yên li hember bikaranîna çekên kîmyewî,



didomin.

Welatiyên bajarê Qamişlo êrişên dewleta Tirk ya li dijî gerîla şermezarkirin û dan zanîn ku berxwedana gerîla ya dîrokî wê humû êrişên dagirkeriya Tirk têk bibe. Herwiha banga yekîtiya gelên herêmê kirin

Welatiyê bi navê Fewaz Sibhî diyar kir ku ji ber têkçûyîna artêşa dewleta Tirk ya dagirker li çiyayên azad, dagirkerî çekên kîmyawî li dijî gerîla bikar tîne û wiha got: "Dewleta Tirk pişta xwe daye teknîka serdemê û çekên qedexekirî û kîmyewî. Êrişên ku bi van çekan li ser qadên gerîla dike ne ji hêzbûnê ye, ev bê hêzbûna wan nîşan dide. Tevî her cûre çekên qedexekirî û kîmyewî ku li dijî gerîla bikar tîne jî, lê li hemberî berxwedana gerîla bibin dikevin û bi sedan leşkerên wê yên dagirker tên kuştin."

**`Qirkirina Kurdan bi erêkirina hêzên navneteweyî tê kirin`**

Fewaz Sibhî diyar kir ku bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve li dijî gerîla tê bi karanîn, sûcê şer e û binpêkirineke eşkere ya li hemberî pîvanên mirovahiyê ye û wiha domand: "Bikaranîna çekên kîmyewî sûcekî şer e û sûcekî li dijî mirovahiyê ye. Qaşo bikaranîn, depokirin û veguhastina wan çekan di qada navneteweyî de qedexe ye, lê dewleta Tirk li ber çavên tevayiya cîhanê bi kîmyawî êrişî gerîla dike. Ev tê wateya ku bikaranîna çekên kîmyawî li hemberî kurdan bi dilê hêzên navneteweyî ye û ev hêz hevkarên dewleta Tirk ya dagirkerin."

**`Armanca dagirkeriya Tirk tunekirina gelên azadîxwaz e`**

Fewaz Sibhî da zanîn ku dewleta Tirk ya dagirker dijmina gelên azadîxwaze û axaftina xwe wiha qedand: "Dewleta Tirk polîtîkaya tunekirina gelên azadîxwaz dimeşîne û her kesê ku banga azadiya xwe û ya gelê xwe dike, wan dike hedef. Şerê wê ne tenê gelê kurd dike hedef, lê belê her kesê ku alîgirê azadiya gelan be, wan dike hedef. Di dîroka de, dewleta Tirk ya dagirker li ser qirkirina gelên azadîxwaz siyaseta xwe ya neteweperestî daye avakirin."

**`Gerîla temsîla xeta parastina tevahî gelên Rojhilata Navîn dike`**

Welatiya bi navê Newroz Salih jî êrişên dewleta Tirk ya dagirk yên ser Tevgera Azadiya Kurdistanê şermezar kir û got: "Şervanên Hêzên Parastina Gel gerîla ne tenê xeta parastina gelê Kurd in, lê belê xeta parastina tevahî gelên Rojhilata Navîn in ku bi xetereya dagirkirinê ya dewleta Tirk re rû bi rû ne. Gerîla berxwedaneke mezin didin meşandin û ne paşvekişîn, ne jî teslîmbûnê nas nakin. Tevî derfetên kêm jî, şervanên azadiyê nahêlin ku artêşa Tirk li çiyayên azad gavekê bi pêş ve biavêje û tevayiya planên wê têk dibin."

Newroz balikşand ser bandora çekên kîmyawî li ser tevaiya herêmê û wiha dewam kir: "Ji nîvê Nîsana borî ve, dewleta Tirk a dagirker çekên kîmyewî bi dehê caran li ser xaka Başûrê Kurdistanê bi kar aniye. Di van çend



rojên dawî de jî wêneyên şervanên ku bandora van çekên kîmyewî li wan bûye ku hatibûn belavkirin, careke din vê yekê îsbat dike. Bikaranîna van çekên kîmyewî hemû gelên li vê erdnîgariyê rûbirûyî xetereyeke demdirêj dihêle. Lê tevî gelek belge û bangên rêxistinên sivîl jî, cîhan bêdenge"

**`Yekîtiya gelan azadiya wan misoger dike`**

Newroz Salih da xuyakirin ku yekîtiya gelêln herêmê wê dagirkeriya Tirk têk bibe û axaftina xwe wiha qedand: "Tevî êrişên domdar yên dagirkeriya Tirk ku tê de hemû çekên giran, pêşketî û çekên kîmyewî bi kar tîne jî, lê wî nekarî armanca xwe ya tunekirina Tevgera Azadiya Kurdistanê pêk bîne. Tişta ku niha ji gelên herêmê tê xwestin ew e ku bibin yek da ku li hember vê desthilatdariya ku temenê wê hezarê salan e, mafên xwe yên rewa bidest bixin û azad bijîn."

## 1'Ê MIJDARÊ PÊNGAVA SERKEFTINÊ BÛ



**Dîlyar Cizîrî**

1'ê Mijdarê salvegera roja Kobanê ya Cîhanê ye. Ev roj, ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyayê, gelê kurd yê li çar aliyên welat û yê derve, pêngaveke dîrokî ya serkeftinê ye. Di wê rojê de derbeyek mezin li DAIŞ û piştevanê wê dewleta Tirk a dagirker, ket.

Di heman demê de 1'ê Mijdarê bû pêngava naskirina îrade û tekoşîna gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

Di encama pêngava vê rojê de Koalîsyona Navdewletî jî neçar ma ku dest bi hevkariya şervanên vê herêmê bike.

Li aliyê din di encama berxwedan û tekoşîna wê rojê de, deriyên dîplomasî û qadên xebatê yên mezin ji siyasetmedar û dîplomatên herêmê re hatin vekirin. Li ser wî esasî Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevî êriş, dorpêç û planên mezin ên li ser asta welatan têne kirin, li ber xwe dide û gavan diavêje.

Dema em behsa van gavan dikin û 1'ê Mijdarê (Roja Kobanê ya Cîhanê) bibîr tînin, lazime demildest em YPG/YPJ'ê jî, bibîr bixin. Şervanên vê hêzê bi piştgiriya gêrîlayên HPG'ê û ciwanên ji 4 aliyên welat, hêmanên vê rojê xêz kirin û li pêşiya Kobanê û tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bendek ji hesin ê parastinê ava kirin.

Ji ber wê jî dema em 1'ê Mijdarê bibîr bixin, lazime em ked û tekoşîna şervanên azadiyê yên bi canê xwe bendek ji hesin li pêşiya dijminên vê herêmê û di serî de jî li pêşiya Dewleta Tirk ava kirin, ji bîr nekin. Di encamê de em dinerin dewleta Tirk û şefê faşîst Erdogan, her çendî rojan gefa êrişên nû li dijî herêmê dixwar jî, çira kesik ji aliyê navdewletî yên di Sûriyê de xwedî bandor wekî Rûsiya û Amarika wernegirtiye.

Ez di vir de ne dibêjim Amarika û Rûsiya piştgiriya gelê herêmê dikin, lê ew dizanin di herêmê de hêz û vînek mezin heye, ji ber wê jî nikarin bi hêsanî bazarên xwe bi cih bînin. Hêmanê wê yê bingehîn jî Berxwedana Kobanê ye.

Dewleta Tirk jî li dijî wateya vê rojê bi her awayekî di nava hewldanan de ye. Ji lewma bi her rê û rêbazan dixwaze derbeyan di Kobanê de, li gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bixwîne. Ev bi êrişên rojane li dijî Kobanê û gundên wê, an jî bi siyasetên valakirin û dûrxistina ciwanan ji Kobanê pêk tê.

Dibe hin kes pirs bikin, ma çi li Kobanê heye? Kobanê di dîroka Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî giringî û wateyeke mezine. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji wir destpê kir. Berxwedana Kobanê berdewam kir û 1'ê Mijdarê bi encam kir. Ji bo wê jî dijber, bi hemû rê û rêbazan hewl didin vê watedariyê ji xelkên wê bigirin.

Li ser wî esasî ji xelkên Kobanê û tevahî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelê kurd bi giştî jî tê xwestin ku bi rihê Berxwedana Kobanê xwedî li hêzên xwe yên leşkerî û hemû destkeftiyên xwe derkevin.

# `1 Mijdarê Serkeftina Şerê Gelê Şoreşgerî bû`

**Zana Roj/ Şehba**

Rîhan Elo diyar ku Kobanê efsaneya berxwedanî û têkbirina paşverûtiyê ye û got, êrişên çeteyan yên ser Kobanê dewamiya Komploya Navneteweyî bû û ragehandina 1`ê Mijdarê (Roja Kobanê ya Cîhan) jî serkeftina Şerê Gelê Şoreşgerî bû

Piştî ku çeteyên DAÎŞ'ê nîvê meha Tebaxa ya 2014'an êrişî Kobanê kirin, ji bo piştgiriya şervanên Kurd li hemû bajarên cîhanê, azadîxwaz û Kurd daketin qadan û piştgirî dan berxwedana Kobanê. Çiqas dorpêça li ser Kobanê deng dabû, piştgiriya şervanan jî zêdetir dibû. Gelên li çar aliyê cîhanê dizanî ku eger Kobanê



ji DAIŞ'ê rizgar nebe, wê her deverê cîhanê bikeve bin xeteriya wan çeteyan. Lewma, azadîxwazên cîhanê 1'ê Mijdarê weke 'Roja Cîhanî ya Piştgiriya Kobanê' ragihandin. Di vê rojê de, li seranserî cîhanê ji bo piştgiriya berxwedana Kobanê çalakî hatin darxistin. 1'ê Mijdarê roja Kobanê ya Cîhanî tekez kir ku Şoreşa Rojava şoreşa hemû gelan e.

Têkildarî Roja Kobanê ya Cîhanî endama Kordînasyona Kongira Star ya herêma Efrînê Rîhan Elo ji rojnameya me re axivî.

**`Hedefgirtina Kobanê berdewamiya Komploya Navnetewî bû`**

Rîhan Elo diyar kir ku destpêkirina êrişên çeteyên DAÎŞ`ê yên ser Kobanê, dewamiya Komploya Navnetewyî ya li ser Rêber Apo bû û wiha got: "Çirûska Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji Kobanê dest pê kir û belavî hemû Rojava bû. Êrişên çeteyên DAÎŞ`ê yên ser Kobanê ku bi destekdayîna dewleta Tirk ya dagirker û erêkirina hêzên Rojavayî pêk hat, berdewamiya Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Ocalan bû. Armanca hedefgirtina Kobanê, têkbirina vîna gelên herêmê û kontrokirina bajarê Kobanê ku xwedî cihekî stratijî û navîn, di navbera herêmên Rojava de ye."

**`Planên qirkirina Kurdan hîn berdewam in`**

Rîhan Elo da xuyakirin ku armanca Tirkiyê ya qirkirinê hîn jî didome û wiha got: "Êrişên li ser Kobanê û berxwedana dîrokî, ne mijara tinê pêvajoyekê ye. Ev êrîş, kîna dewleta Tirk a li hemberî gelê kurd dide nîşandan, divê em vê pêvajoyê baş binirxînin û hertim bînin bîra xwe ku qirkirina gelê kurd bi destê dewleta Tirk dest pê kir û heya niha jî berdewame. Mînakên wê jî berçavin, ji Dersîm, Agirî heya Efrîn, Serê kaniyê û Girê Spî didom e. Lê, em dikarin bêjin ku di dîroka kurdan de, ev cara yekemîn bû ku li seranserî cîhanê ewqas çalakî ji bo piştgiriya Şervanên kurd (YPG/YPJ) hatin kirin".

**`Hêza Gerîla ji planên qirêj yên hêzên navnetewî mezitir bû`**

Rîhan Elo tekez kir ku ev çalakî û têkoşîna kurdan hişt ku cîhan, çavên xwe ji kurdan re veke û wiha domand: " Têkoşîna ku hatiye kirin rihê yekgirtin û seferberiya tavahî hêzên kurd û bi



taybet berxwedaniya a efsanewî ya ku ji aliyê gerîlayên Kurdistanê ve hatiye meşandin hat xuya kirin. Ji ber vê cîhan pê hesiya ku wê serkeftin para gelê Kurd be. Lewma ji bo ku bibe hevalbendê me û yê vê serkeftinê, koalîsyon bi rêya Kobanê derbasî Sûriyê bû. Ev yek jî bû sedem ku tavahî cîhan û hêzên global bibînin ku ji derveyî gel û şervanên kurdan tu hêzan nekarî DAÎŞ'ê ji holê rakin."

**`Hêza jinên azad çete hilweşandin`**

Endama Kordînasyona Kongira Star ya herêma Efrînê Rîhan Elo bal kişand ser berxwedaniya jinên kurd ya ku li Kobanê bû sembol û wiha got: "Gerîlayên YJA Star bi cesareteke mezin li hemberî çeteyan şer kirin û careke din di parastina gelê Kurd de, bûn pêşeng. Her wiha çalakiya Arîn Mîrkan ji cîhanê re îspat kir ku Kobanê xeta parastina nirxên mirovaiyê ye û bû mîrateya berxwedana jinê."



# `Armanca Hikumeta Şamê û dagirkeriya Tirkî yeke`

Berpirsên Rêvberiya Xweser yên herêma Efrînê diyar kirin ku, armanc hikumeta Şamê ji ambargoya li ser herêma Şehbayê, têkbirina îradeya gele û gotin, ne ambargoya hikumeta Şamê û ne jî êrişên dagirkeriya Tirk wê nikaribe vîna gelê berxwedêr, têk bibe.

**Zana Roj/ Şehba**

Piştî dagirkirina herêma Efrînê ji aliyê dweleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê ve, gelê Efrînê koçberî herêma Şehbayê bû. Gelê ku li herêma Şehbayê bicihbûye, ji aliyê hikumeta Şamê ve embargo li ser hatiye ferzkirin. Di dema dawî de hikumeta Şamê, embargoya li ser herêma Şehbayê girantir kir û derbasbûna sotemeniyê ji bo herêmê qut kir. Vê yekê bandoreke xerab li ser rewşa elektirîk, tevgera gel û karê şaredariyê yê xizmetguzariyê kir.

Derbarê embargoya hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehbayê, hevserokê Meclisa Kantona Şehbayê Cuma Kalo û hevseroka Komîteya Şeredariyê a kantona Efrînê Firyal Cimo ji me re axivîn.

**`Armanca wan tunekirina projeya Netweya Demokratîk e`**

Cuma Kalo diyar kir ku li dijî herêmên Rêveberiya Xweser siyaseteke navneteweyî tê meşandin û got, Ambargoya li ser herêma Şehbayê û siyasta ku li ser gelê herêmê tê meşandin, encama lihevkirinên di navbera îstîxbaratên hikumeta Şamê û Mîta Tirkiyê de ye. Helbet ev siyaset bi destekdayîna Rûsiya û hêzên navnetewyî tê kirin. Tevayiya siyaset û êrişên li dijî herêmên Rêveberiya xweser, bi armanca têkbirina projeya Rêveberiya Xweser ya Neteweya Demokratîk û Biratiya gelan e. Hêzên navnetewyî yekîtiya gelan ya di bin sîwana fikr û felsefeya Rêber Apo de, li ser desthilatdariya xwe xeter dibînin, ji ber wê bi hemû rêbazan hewil didin ku vê rêberiyê hilweşînin.

**`Wê Berxwedana gel planên wan pûç bike`**

Cuma kalo da zanîn ku armanca hikumeta Şamê ji ambargoya li ser herêma Şehba, têkbirina vîna gele û axaftina xwe wiha qedand: "Hikumeta Şamê dixwaze bi riya ambargo zextê li gelê berxwedêr bike û gel ji xeta azadiyê dûr bixe. Dixwaze di her aliyî de zehmetiyan derxe pêşiya gelê Efrînê. Ev ampargo di bin hevkariya Rûsya û hêzên navnetewyî yên li ser xaka Sûriyê tê meşandin. Her ku asta êrişên dagirkeriya Tirk yên li ser herêma Şehbayê zêde dibin, hikumeta Şamê jî ambargoya li ser gelê vê herêmê giran dike. Helbet êrişên dagirkeriya Tirk û ambargoya hikumeta Şamê di hundirê yek planê de tên meşandin, armanca wan ya sereke têkbirina îradeya gel e. Lê wê hevgrtin û berxwedana gel planên wan pûç bike û siyaseta wan ya li dijî gelan vala derxe"

Hevseroka Komîteya Şeredariyê Ya kantona Efrînê Firyal Cimo jî diyar kir ku ambargoya li ser Şehba bûye asteng li pêşiya karên xizmeguzarî yên Şaredariyê û wiha got: "Ji ber ambargoya hikumeta ya li ser herêma Şehbayê, kar û



xebatên şaredariyê yên ji bo xizmeta gel zehmet bûye. Bendên kontrolê yên hikumeta Şamê ji bo hiştina derbaskirina mazotê , baceyên zêde dixwaze. Ev yek bûye sedema nehazirkirina rê û dibistanan. Herwiha ji ber kêmbûna mazotê, dayîna elektirîkê ji bo gel , ji 6 seatan, daketiye 3 seat û nîvan."

Firyal da xuyakirin ku ambargoya hikumeta Şamê ya li ser herêma Şehbayê, êşên gel yên ji ber koçberiyê zêdetir dike û got, beriya werzê zivistanê pêwîste mazot li gel bê belavkirin, lê ji ber ku hikumeta Şamê derbasbûna mazotê qut kiriye, belavkirina mazotê li ser gel nepêkan e. Eger serma zêde were û mazot tune be, wê




bandorek pir xerab li ser gel bike."

**`Divê rêxistinên mirovî bi erka xwe rabin`**

Hevseroka Komîteya Şeredariyan Ya Kantona Efrînê Firyal Cimo, banga li tavahî rêxistinên mirovî kir ku li hemberî ambargoya li ser gel bêdeng nemînin û axaftina xwe wiha qedand: "Ev 5 salin hikumeta Şamê siyaseta qirêj ya dorpêçkirinê li ser gelê Efrînê yê li Şehbayê dimeşîne. Lê wê tu carî bi vê siyaseta xwe ya xerab, nikaribe îradeya gel têk bibe. Gelê me wê weke topeke ji agir be û têkoşîna azadiyê dewam bike. Em bangê rêxistinên mirovî dikin ku bi erkê xwe ya exlaqî rabin û xwe bêdeng nekin."

## 1`ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanê



**Zekî BEDRAN**

1`ê Mijdar`ê roja Kobanê ya cîhanê tê pîrozkirin. DAÎŞ bi hêzeke mezin êrîşê Kobanê kiribû. Bi çek û tankên ji artêşa Sûrî bi dest xistibûn, êrîş kiribû. Kobanê ji bo êrîşeke wiha amade nebû. Lê, YPG û hêzên şoreşger bi derfetên kêm, bê ku guman bikin biryara berxwedanê dan. Di vê demê de DAİŞ'ê Rojhilata Navîn kiribû agir. Artêşa Iraq`ê jî Musil berdabû, DAİŞ li Musil xwe gîhand hêzeke mezin ya mirov û ya çekan. DYA û dewletên mezin û her wiha hêzên herêmî, nedîzanîn ka çi bikin. Ew vîna ku hêza leşkerê xwe bişînin şer, nîn bû. Li hember vê tirs û xofa cîhanê, bi derfetên sînordar Kurd li dijî DAİŞ'ê berxwedan; qedera herêm û şer dîyar kirin. Berxwedanê Kurdan ya bêhempa û sekna wan ya hember hêzên tarî, di tevayî cîhanêde deng veda, hêvî û hevkariyek derxist holê. Ji bo Kobané nekeve, li tevayî cîhanê de çalakî û meş hatin li darxistin. Ji bo hevkarî bê mezinkirin û berxwedan binnekeve 1`ê Mijdar`ê weke roja 2Kobanê ya Cîhanê' hat ragihandin.

Artêşa Hitler şerê cîhanê yê 2'yemîn de êrîşê yekîtiya Sovyet kiribûn, gîhîştibûn heta Moskov. Bajarên weke Stalingrad Dorawan hatibûn girtin. Lê gelên Sovyet û pêşengê wan, hember faşîzma Alman şerekî ku bi salan bidome meşandin. Artêşa Almanan li hember Stalingrad, şikestin. Ev tişt rê vekir ku faşîzm serberjêr here. Qedera şer hat gûhertin. Artêşa Sovyet bera dagirkerên Alman dan heta Berlin'ê. Sovyet barê şer girt ser milê xwe û windayiyên mezin da. Tevlîbûna şer ya DYA û îttîfaqa wê, wekî bûyera Kobanê, piştî ku Sovyet herikîna şer gûhert, çêbû.

Pir kesan Kobanê şibandin Stalingrad. Piştî ku DAİŞ li Kobané şikest, daketina wî ya serberjêr destpêkir. DYA û hêzên hevpeyman ketin dewrê û DAİŞ ji Rakka, herî dawî jî hetta Baxoz bera wî dan û hat binxistin. Gelek aliyan dereng fêm kir ka belaya DAİŞ'ê çawa ye. Dewletên mezin jî di navde, gelek alî bir dereng ketin nava tevgerê. Dema xeterî fêm kirin jî ne dizanîn çi bikin. DYA û dewletên awropî, şereke bejayî negirtin ber çav. Artêşê ereban jî belav dibûn. Artêşên ereban di serîde Sûrîye û Iraq tê ew jî belav bûn. Berxwedana Kobané, ketina dewrê ya Kurdan herikîna bûyeran gûhert. Bi pêşengiya Kurdan Rojhilata Navîn û cîhan, ji DAİŞ'ê xelas bûn. Kurd bûn hêzeke pêşengên şer ya cîhanî. Berxwedana Kurdan, vîna wan ya xurt, ji bo hêzên weke DYA dem da kezenckirin. Ji wana re derfet çêkir ku xwe komîserhev bikin û biryaran bigrin.

Berxwedan û serkeftina Kobanê nebaye, wê li Rojhilata Navîn rewş pir cûda biba. Lê, kê berê DAİŞ'ê da Kurdan û Kobané? Tirkîyê, ji bo Kurd bên pelçiqandin di her merheleyêde alîkarî da DAİŞ û sînorê xwe ji wan re vekir. Yê ku bin re jî alîkarî didan, yê ji wan ditirsiyan jî pirbûn. Kurd nebane kesê nedikarî DAİŞ'ê bisekinîne. Bingeheke Kurdan ya pir xurt ya bîrdozî û rêxistinî heye. Rêber Apo ji bo Kobané banga seferberiyê kir. Li her derê, gelê Kurd rabun ser piyan. Tevgereke şoreşgerî û gel, vîna(îrade) xwe derxist holê. Ger serê DAİŞ'ê li dîwarê Apocîyan neketa, bê guman niha Rojhilata Navîn tevayî di destê DAIŞ'ê de bû.

Kurdan ji bo mirovayî xizmetek mezin kirin. Berdêlên mezin dan. Li Rojava zêdetirî 10 hezar şehîd dan. Bawer dikirin ku tiştê dikin raste ji ber wî kirin. Xwe weke beşek malbata mirovayiyê dîtin, ji ber wê hesabeke din nekirin. Jinên şoreşger bûn kabûsa DAİŞ'a ku artêşên dewletan ji ber direviyan. Di Şoraşa Rojava de jinan mohra serkeftina tekoşîna azadiya jinê li Rojhilata Navîn xistin, rengê xwe dan. Şoreşa Rojava, şexsiyetek enternasyonal bi dest xist. Ji gelê din û welatên din gelek mirov hatin, tevlî şer û berxwedanê bûn. Hêştin ku li cihanê serdemek nû destpê bike.

Erdogan di wan rojan de digot, 'Kobanê ket wê bikeve', Pişt re jî wê Efrîn bikeve' mizgîniya ku Kobané wê bi destê DAİŞ'ê bikeve, dida. Vê helwesta wî ispat dikir ku bi DAİŞ'ê re çikas şirîke, çikas di nav hevdudan e. Dema DAİŞ Şkest, faşîst Erdogan raste rast bi xwe ket dewrê. Artêşa Tirkan bi hilweşandinek û qirkirinek netewî, Efrîn dagir kir. Ji bo Kobanê jî dagir bike jî bê navber lêgerîn û êrîşên xwe didomîne. Ji DYA heta Rusya, ji Îsraîl heta Îran, ji NATO heta Pênc şirîkên Şanghay ji hemû hêzên cîhanê alîkarî digre ku Kobanê bixîne û hebûna Kurdan bi dawî bike.

Şefê Faşist Erdogan û yên wek wî ku dijminên mirovayiyêne, ji bo armancên wan yê qirker û belavkar di dilê wande bihêlin, parastina Kobanê û şoreşa Rojava erkek herî sereke yê şoreşgerî ye. Roja rûhê Kobanê û hevkarîya cîhanê dîvê bê bilindkirin. Dem dema gotina yek, dû û hîn zêdetir Kobanê ye!